



COMBINED JOINT TASK FORCE OPERATION INHERENT RESOLVE

Public Affairs Office

April 3, 2020
Release No. 20200403-01
FOR IMMEDIATE RELEASE

Hevpeymaniyê amûrên Kovid-19ê ji bo Bakurê Rojhilatê Suriyeyê dabîn kirin

Başûrê Rojavayê Asyayê - 27ê Adara 2020ê li Bakurê Rojhilatê Sûriyeyê, Hevpeymaniyê (Hêzê Erkê Hevkarî - Pengava Cidîbûna Cewherî) ji bo xebatên rêgirtina li ber belavbûna Kovid-19ê li Heskê û Şedadêyê teqrîben bi nirxê 1.2 milyon dolarî pêdawîst dabîn kirin.

Alavên bijîşkî dê alîkariyê xebatkarên li nexweşxaneyên Heskê û Şedadêyê û herwiha Hêzên Sûriyeya Demokratîk (HSD) û hêzên Asayîşê yê li ber kampên destserkirinê bikin.

Kovid-19 bûye sedem ku çavkaniyên bijîşkî li seranserê cîhanê kêm bibin. Armanca vê piştgiriya ew e ku amûrên pêwîst bigihêjin HSDê da ku nehêle vîrûs zêdetir li nav gelheya bêçare belav bibe.

Cîgirê Birêveberê Têkiliyên Sivîl ê Hevpeymaniya leşkerî ya navdewletî ya dijî DAIŞê Kolonel Brian Henderson got, "Di vê deme de ku hevparên me istiqrara li herêmê bi pêş de dixin, hevpeymanî dê piştgiriya xwe ji bo xebatên wan dewam bike.

Ev hevpariya berdewam, ji çarçoveya pandemîk berfirehtir e û ji bo peywira HSDê ya pêkanîna ewlekarî û isriqarê li bakurê rojhilatê Sûriyeyê jî giring e."

Alavên xwepararstinê yê şexsî yê wek lepikên lateks û mask û herwiha amûrên nişteriyê, defibrilator, oksîjenpîv(alavên oksîjenê dipîve) ji nexweşxane û tesîsên desteserkirinê yê li seranserê herêma Heskê û Şedadêyê re hatine dabînkirin. Li gel wan, zixên şexsî ji bo pasevanan hatine dabînkirin ku mask, mertal û çovên lêdanê di nav wan de ne.

Li çend tesîsên desteserkirinê yê li bakurê rojhilatê Sûriyeyê ku nêzîkî 10 hezar milîtanên DAIŞê li wan tîm girtin, HSD bi temamî berpirsyara operasyonên rojane ye. Parastina tenduristî û ewlehiya kesên desteserkirî tiştêkî bingeîn e ji bo ku rê li ber tundûtûjî û hewlên revê were girtin. Hevpeymanî ji bo piştgiriya hevparên me yê ewlehiyê, perwerdehî û amûran dide da ku bikarin peywira xwe ya giring pêk bînin û nehêlin DAIŞ careke din serî hilde.

Berdevkê Hevpeymaniyê Kolonel Myles B. Caggins III got, "Hevparên me li Sûriyeyê bêtirî bîst kampên desteserkirina DAIŞê kontrol dikin û bi temamî berpirsyarên sexbêriya wan in", û wiha dewam kir, "Di bin madeya 1209ê ya Dewletên Yekbûyî ya Destûrdana Parastina Neteweyî ya 2015an, Fonkirin û Sazkirin (CTEF) alîkariya diravî jî dide HSDê da ku operasyonên xwe yê li dijî DAIŞê pêk bîne. Di mijara Kovid-19ê, CTEF herwiha destûrê dide ku fon ji bo bidestxistina amûrên xweparastina şexsî ji hevparên me yê li Sûriyeyê û girtiyên wan ên DAIŞê jî bê mezaxtin. Divê her kirareke kerrîne di pêvajoyên guncav ên daxwaz û nixandîne re derbas bibe."

Îsal, Wezareta Parastinê ya Amerîkayê 200 milyon dolar ji bo piştgirtina HSDê destnîşan kirin, bi taybetî ji bo peywira dijî DAIŞê.



COMBINED JOINT TASK FORCE OPERATION INHERENT RESOLVE Public Affairs Office

27ê Adarê, Wezîrê Derve Mike Pompeo ji bo Kovid-19ê alîkariya mirovî û ya tenduristî ya bi qasî 16.8 milyon dolarî ragihand.

Alîkarî encama xebata hevpar a Navenda Operasyonên Leşkerî-Sivîl a Dijî DAIŞê ya Perwerdekirin, Fonkirin û Sazkirinê CJTF-OIR – Şedadê û Kordînasyona û Navenda Operasyonên Leşkerî -HSDê bûye.

-30-

Photos: <https://www.dvidshub.net/image/6157974/coalition-civil-affairs-divests-equipment-further-stabilize-ne-syria>

SDF Statement: https://twitter.com/cmoc_sdf/status/1244673986329542656?s=20

U.S. State Department Fact Sheet: The United States Is Leading the Humanitarian and Health Assistance Response to COVID-19

<https://www.state.gov/the-united-states-is-leading-the-humanitarian-and-health-assistance-response-to-covid-19/>